**Hûn bi xêr hatine North Lees Hallê**
**Ku perçeyekî Axa Stanage/North Leesê ya Birêvebirîya Parkên Millî ye.**

**Eywaneke bi tarîxê tije.**
Berî 150 salan gava hûn li vê deverê rawestîyan, di yek ji serdanên North Lees Hall-ê de dibe hûn rastî Charlotte Bronteyê îkona edebiyatê hatibin. A rastî bi gumanan eywan bixwe ji Koşka Thornfielda xeyalkirî ya li Jane Eyreyê re jêdera îlhamê ye.

Mala kelehê di paşîya sedsala 16an de hatiye avakirin. Dibe ku avakar Robert Smythsonê li Saraya Longleatê ya Wiltshire-ê pîşeya xwe fêrbûyî be û li nêzîkê Chesterfieldê Hardwick Hallê û û Wollaton Hall-a Nottinghamê sêwirandibe.

Di Axê de ji Serdema Bronzê ta roja îroyê taybetîyên mîrasê di nava xwe de dihewîne. Eywan û cotgeha firehtir di sala 1978an de ji alî Parka Millî ve hatiye kirrîn û îro kirêkirên taybet ên li vê derê dijîn û dixebitin, wê xwedî dikin. Ji bilî van hûn dikarin devera kempê û mala çolê ya wek cîhê bicîhbûna mêvanan a ji alî Birêvebirîya Parka Millî ve tê birêvebirin jî bibînin.

**Cotkarîya parêzkar**
Ji dema ku me fehma bizavên cotkarîyê yên firktir kiriye ve di salên paşîn de awayê guhdana erdên me yên Axê jî guherî. Di zevîyên dora North Lees Hall-ê de dibe hûn hem pez û hem dewarên ku ku ji bo berhemanîna standardeke gelek baş a goştê berxê û berxan têne hilberandin jî bibînin. Di nava vê de bi awayê bijarte çêrandina hindek cîhên xuyandî yên cotgehê, astengkirina ‘çêrandina zêde’ û tengavkirina bêtir a axê heye.

**Karkirina bi jîngehê re**
Hunerên çolî yên adetî yên wek sênckirin û dîwarjenîya bi kevirî alî Axê dikin ku xuyê wê bê parastin. Sênc herweha ji bo jîyana kûvî di seranserê salê de hêlînê û xurekîyê peyda dikin. Dîwarên kevirî yên ziwa ji bo pûşan, kevzan, zexesan û çendek gîyanewerên bê movik giring in. Di mehên biharê û havînê de piranîya mêrgan bi kulîlkên çolê û gîyayan candar dibin; wek nimûne paxirê piçûk ên (li dîmenê) û moz û bilbilîtankên belavkerên tovî bixêrhatinîyê dikin. Ev xebat bi ‘pûşê kesk’ ê ji çar alîyê Peak District-ê berhevkirî ve hatiye destekkirin û wisa hatiye kirin ku cûrên bikarhatî bi koka xwe herêmî bin.

__Kûçik__
Ji bo çûkên li erdê hêlînê dikin û û heywanên din ên kûvî acis nebin bera hevsarê kûçikê we hebe.

__Derî__
Derî û zomaxên maqûl bi kar bînin. Derîyên we vekirî bigirin û ji nû ve kilît bikin.

__Gilêş__
Rêçê nehêlin. Ji bo gilêşê û bermayîyên sehî satila gilêşê bi kar bînin yan jî a baştir; gilêşa xwe bibin malê.

__Agir__
Ji agirê kempê û manqelê re destûr nayê dayîn. Seyran xweş e lê ji kerema xwe paqijîyê bikin û yên we anîye bibin malê.